Di qonaxa piştî salên 2002yê da, pêşîya xebatên kurdî qismî be jî vebû û hinek qedexa hatin rakirin. Piştî 2010ê jî di çend zanîngehan da beşên kurdî vebûn û kurdî cara yekem di pergala perwerdeyê da jî hat bikarînan. Herweha dayîna mafê dersa kurdî ya di dibistanên navîn da jî gaveka erênî bû û bandorên wê yê erênî çê bûn. Ev bûyer û nemaze zêdebûna deştîfîyên sîyasî yê kurdan, bûn sedem ku xebatên li ser kurdîyê jî zêdetir bibin. Gelek komele û weşanxane ava bûn, gelek koe varên akademîk û pirtûkên curbicur derketin û kurdî hinekî bi ser xwe ve hat. Yek ji warên van xebatan jî xebatên termînolojîyê bûn. Li ser termînolojîya saheyên curbicur hem xebatên takekesî hem jî sazgehî pêk hatin. Di vê heyamê da xebatên wekî “Ferhenga Zanîstên Civakî” (Abdullah Kîran, 2014), “Ferhenga Teknîk” (Suat Yavuz, 2014), “Ferhenga Termên Fenî” (Bahattin Gümüş, 2015) û hinekên din hatin kirin. Herweha di bin banê Şaredariyê Dîyarbekirê da lijneyek hat avakirin ku li ser termên îdarî disekin û hewla kurdîkirina wan têgihan dida.

Li ser vê paşxaneyê ku me behs kir, di 2017an da Baroya Dîyarbekirê û Weqfa Mezopotamyayê hatin cem hev û deşt bi xebata kurdîkirina termên hiqûqê kirin. Vê xebata kolektîf zêdetirî sê salan dewam kir û ji bo xebatê 22 civînên mezin çê bûn ku hinek ji van civînan çar-pênc rojan dewam dikir. Di encamê ve xebatê da pirtûka bi navê “Ferhenga

Têgihên Hiqûqê” (2019) hat çapkirin û bi raya giştî ra hat biparvekirin. Ev xebat ji alîyê rê, rêbaz û pêkhatina xwe ve xebateka giring bû û çend qonaxên vê hebûn. Niha em dê yek bi yek li ser rê, rêbaz û qonaxên vê rawestînin.

1. Qonaxa Yekem: Tesbîtkirina Rê û Rêbaza Xebatê

Weqfa Mezopotamyayê û Baroya Dîyarbekirê di serê sala 2017ê da ji bo rê û rêbaz û prensîpên vê xebatê, bi beşdarîya zimannasên Weqfê û pisporên hiqûqê yên Baroyê civînek li dar xistînin. Di vê civînê da nîqaşên dîrûdirêj hatin kirin ku ev xebata kolektîf dê çawa bi rê ve biçe. Di encamê da biryar hat dayîn ku li gor van xalan ev xebat bihê kirin:

1.1. Rê û Rêbaza Xebatê

Xebatên li ser terman gelekî zehmet in û divê mirov di encama nîrxandin û nîqaşên dîrûdirêj û pîralî da bigihîje encamê. Loma biryar hat dayîn ku divê bi awayê komxebatan (workshop) ev xebat pêk bihê. Ji bo ku komxebat bi awayekî pratîk û hêsan bi rê ve biçin hejmarê beşdaran bi bîst kesan, hat sînorkirin. Ji ber ku ev xebat hem bi saheya hiqûqê hem jî bi sehaya zimanî ve têkildar bû, biryar hat dayîn ku hem hiqûqnas hem jî zimannas di vê xebatê da cih bigirin. Lewra jî pêwîst bû tiştên ku hiqûqnas pêşnîyaz dikin li gor pîvanên zimanî jî bin. Ji ber ku dema tiştên li dijî rêbazên dariştina peyvên kurdî bihên pêşnîyazkirin divê zimannas wan serraşt bikin. Ji alîyê din ve jî giring bû ku hiqûqnas behsa pênase û naveroka terman bikin û zimannas jî li gor wan pênaseyan pêşnîyazan bikin. Yanî hat nîrxandin ku dema hem pisporên hiqûqê hem jî zimannas hebin, dê ji hevûdin sûd wergerin û hevûdin temam bikin.

Prensîpeka din jî ku têkildarî taybetmendîyên beşdaran hat dîyarkirin ew bû ku dive ji xebat û akademîsyenên ji Başûrê û Rojhilatê Kurdistanê jî sûd were girtin. Lewra eger xebateka akademîk bihê kirin, lazim e ji tecrubeya Başûrê û bi taybetî jî ji ya kurdîya naverast sûd bihata

wergirtin. Loma jî biryar hat dayîn kesên pispor hem di saheya zimanî da hem jî ya hiqûqê da bihên dawetkîrin. Bi vî awayî jî heft kesên pispor ji Başûr û du jî ji Rojhilata Kurdistanê beşdarî vê xebatê bûn.

1.2. Sînorkirina Xebatê

Çawa ku dihê zanîn, bi hezaran termên hiqûqê hene. Loma gelek zehmet e ku mirov di carekê da bi hezaran terman bike kurdî. Ev kar hem ji alîyê demê ve hem jî ji alîyê birêxistinê ve, gelekî zehmet e. Loma biryar hat dayîn ku ji bo destpêkê xebat tenê li ser hezar termên sereke bihê kîrin. Ji bo ku termên sereke jî bihên tesbîtkîrin, hat nirxandin ku divê li gor şaxên hiqûqê yên sereke term bihên hilbijartin. Loma biryar hat dayîn ku bijartina terman, li gor şaxên sereke yên hiqûqê be. Şaxên hiqûqê ku termên hiqûqê ji wan hatin hilbijartin jî ev bûn: *Hiqûqa medenî*, *hiqûqa bazirganî*, *hiqûqa sizayî*, *hiqûqa kargêrî* (îdarî). Herweha termên sereke yên *hiqûqa giştî* jî lê hatin zêdekirin.

1.3. Avakirina Lijneya Amadekar

Di civîna rê û rêbazê da yek ji biryarên giring ew bû ku divê lijneyek amadekar bihê avakirin û xebat ji alîyê wê lijneyê ve bihê meşandin. Ji ber ku pewîst bû karê tesbîtkirina hezar termên sereke bihata kîrin, lijneyek ji deh kesan hat avakirin ku liştaya termên sereke amade bikin. Ji bo koordînatoriya vê komê jî du kes, ku yek li ser navê Weqfa Mezopotamyayê yek jî li ser navê Baroya Dîyarbekirê, hatin hilbijartin.

1.4. Amadekirina Liştaya Termên Sereke

Piştî ku di civînê da lijneya amadekar hat avakirin, ji bo rê û rêbaza amadekirina liştaya termên sereke jî prensîp hatin dîyarkîrin. Lijneya ku ji deh kesan ava dibû, li ser komên du kesî hat dabeşkirin ku pewîst bû her komek termên sereke yên şaxeka hiqûqê amade bike. Yanî du kesan dê termên sereke yên *hiqûqa medenî*, du kesan *hiqûqa bazirganî*,

du kesan *hiqûqa sizayî*, du kesan *hiqûqa kargêrî* û du kesan jî termên sereke yên *hiqûqa giştî* amade bikira. Di komxebatan da ji bo ku li ser vê lîsteyê nîqaşên baş bihên kirin, biryar hat dayîn ku îngilîzî, erebî, tirkî, farisî û kurdîya naverast ya wan tegehane jî wekî pênc stûnên cuda li ber wan bihên nivîsîn. Herweha ji bo lîsteya terman ku wekî draft dê di komxebatan da xebat li ser bihata kirin, biryar hat dayîn ku ferhengên kurdî yên heyî bihên kontrolkirin û bergindên wan yên kurdî jî bihên nivîsîn. Bi taybetî hat dîyarkirin ku ji xebata Talebanî (2006); Farqînî (2000); Farqînî (2010); Îzolî (2013); Özdemir (2014); Ebduî lahîzad (2018) sûd bihê wergirtin û alternatîfên cuda yên terman li gor van ferhengan bihên kontrolkirin.

Di encamê da biryar hat dayîn ku li gor van prensîpan draftek ji termên sereke bihê amadekirin û êdî komxebat bihên çê kirin ku biryar ji bo van terman bihên dayîn. Loma lijneyê deh kesî biryar da ku di sê heyvan da draftê amade bikin.

Nimûneyek ji vê draftê:

| Îngilîzî | Kurmancî | Erebî | Farisî | Tirkî | Soranî | Biryara Lijneyê |
|---------------------------|---|----------------|-----------------|---------------------------|-----------------------|-----------------|
| aggravating circumstances | sedemên giranker | ظروف مشددة | كيفية مشددة | ağırlaştırıcı nedenler | hoyekanî sext/tund | - |
| amnesty, pardon | bexş/efû/ bexşandin/ lêborîn | عفو | عفو | af | lêbûrdin | - |
| forensic medicine | bijîşkîya dadî / pizîşkîya dadî/ tîba edlî | الطب العدلي | پزشکی قانونی | adli tıp | pizîşkî dadwerî | - |

2. Qonaxa Duyem: Çêkirina 22 Komxebatan

Piştî ku lijneya amadekar ya ji bo çêkirina termên sereke, lîsteya terman wekî draftekê amade kir, Weqfê û Baroyê biryar dan ku di heyva tîrmehê ya sala 2017an da komxebata yekem çê bikin. Ji bo komxebatê amadekarî hatin kirin û otelekê bajarê Elezîzê wekî cihê komxebatê ji bo çar rojan hat destnîşankirin. Komxebata yekem di 5-6-7-8ê tîrmehê da û bi beşdarîya bîst pîsporên hiqûqê û zimanî hat lidarxistin. Di komxebatê da li ser drafte pênc zimanî, nîqaş dihatin kirin û kurmancîya terman dihat tesbîtîkirin. Rêbaza sereke ya xebatê ew bû ku li ser terman nîqaş û nirxandin bihên kirin û bi rêya rêkkeftinê biryar bihên dayîn. Dema ku di encama nîqaşên dîrûdirêj da derbarê xalekê da rêkkeftin pêk nedihat, derbarê vê xalê da biryar jî nedihat girtin û ew xal vala dihat hiştin.

Di komxebat yekem da zehmetîyek berbiçav derket ku hêjayî gotinê ye. Di çar rojan da tenê li ser 80 termî biryar hatin dayîn û hat famkirin ku xebat bi vî rengî gelek giran dimeşe. Loma di roja dawî ya civînê da li ser rê û rêbaza komxebatê nirxandin hatin kirin û biryar hat dayîn ku berî her komxebatek mezin, divê komxebatên navxweyî çê bibin, nîqaş û nirxandin cara pêşî di van komxebatan da bihên kirin û biryarên komxebatên navxweyî li ser drafte bihên zêdekirin. Yanî dê komxebatên biçûk pêk bihatina û biryarên destpêkê bihatina dayîn û di komxebatên mezin da ew biryar dê bihatina kontrolkirin û biryara dawî li gor komxebata mezin bihata dayîn.

Piştî ku civîna yekem bi dawî hat, heta 9ê hezîrana 2018ê, 8 komxebatên navxweyî pêk hatin. Di van komxebatên navxweyî da dîsa hem pîsporên ziman hem jî pîsporên hiqûqê amade bûn ku gelek ji wan du rojan dewam dikirin. Piştî van heşt komxebatan di 13-14-15-16ê tîrmeha 2018an da dîsa komxebateka mezin çê bû û di ve komxebatê da kontrola biryarên komxebatê navxweyî hat kirin. Di vê komxebata çar rojî da biryar li ser 250 terman hatin dayîn.

Bi vî rengî heta heyva dehê ya 2019ê, bi giştî 22 komxebat (18 komxebatên navxweyî û 4 komxebatên navneteweyî) pêk hatin û drafw tek hat amadekirin ku bi qasî hezar termên sereke tê da hebûn. Di van komxebatan da carinan kesên ku li ser ziman yan jî hiqûqê pîspor bûn jî wekî mêvan beşdarî hin komxebatan dibûn. Lê endamên sereke ku ev xebat pêk înan ev bûn:

- Prof. dr Abdulwehab Xalid Mûsa (Zimannas, Zanîngeha Zaxoyê)
- Prof. dr Bahîz Omer Ehmed (Zimannas, Zanîngeha Duhokê)
- Prof. dr Sebah Reşîd Qadir (Zimannas, Zanîngeha Raperînê)
- Beyar Tahir Seîd (Pisporê Hiqûqê, Duhokê)
- Bîlal Zîlan (Pisporê Hiqûqê, Baroya Dîyarbekirê)
- Cemîl Çelîk (Pisporê Hiqûqê)
- Dr Ebdilah Casim Receb (Vekoler, Duhok)
- Dr Mîkaîl Bilbil (Zimannas, Weqfa Mezopotamyayê)
- Ebdilah Çager (Pisporê Hiqûqê, Baroya Dîyarbekirê)
- Fexrî Karakoyunlu (Pisporê Hiqûqê, Baroya Dîyarbekirê)
- Gevrîye Atli (Pisporê Hiqûqê, Baroya Dîyarbekirê)
- Hekar Findî (Pisporê Hiqûqê, Zanîngeha Newrozê)
- Mehdî Caferzade (Vekoler, Xoresan)
- Nasîh Husên Silêman (Ferhengnûs, Hewlêr)
- Rênas Xendekî (Pisporê Hiqûqê, Baroya Şîrnexê)
- Sabîr Ebdulahîzad (Pisporê Hiqûqê, Ferhengnûs, Urmîye)
- Selehedîn Elçî (Pisporê Hiqûqê, Baroya Dîyarbekirê)
- Semîre Nergîz (Pisporê Hiqûqê, Baroya Dîyarbekirê)
- Serdal Ogmen (Pisporê Hiqûqê, Baroya Mêrdînê)
- Sezgin Dînç (Pisporê Hiqûqê, Baroya Mêrdînê)
- Veysel Vesek (Pisporê Hiqûqê, Baroya Mêrdînê)

3. Qonaxa Sêyem: Amadekirina Ferhengê

Piştî ku 22 komxebat xelas bûn êdî dor hat ser amadekirina ferhengê. Lazim e biryar li ser formata ferhengê bihata dayîn. Piştî ku nirxandin û nîqaşên dûrûdirêj biryar hat dayîn ku formata ferhengê bi vî awayî be:

- a. Ferheng dê kurdî-kurdî (kurmancî-kurmancî) be.
- b. Di ferhengê da dê pênasayên kurdî û mînak jî hebin.
- c. Dema terma kurdî bihê dayîn dê îngilîzî û tirkîya wan jî di parantezê da bihên dayîn.
- d. Di ferhengê da dê termên ku têkildarî wê termê ne jî, di dawîya pênasîyê da, bihên dayîn.
- e. Di dawîya ferhengê da wekî pêveka ferhengê dê bi tirkî, kurdî, îngilîz, erebî û farisî lîsteya terman bihê dayîn.

Piştî ku biryar li ser van xalan hat dayîn, du edîtorên vê xebatê; pisporê hiqûqê Sabîr Abdulahîzad û pisporê zimanî Mîkaîl Bulbul dest bi amadekirina ferhengê kirin. Sabîr Ebdulahîzadî pênasê û mînak lê zêde dikirin û Mîkaîl Bulbulî jî kontrol dikir. Piştî ku bi vî awayî xelas bû, edîtoran lîsteya terman ya pênc zimanî jî lê zêde kirin. Ev lîste ji bo kontrola dawî ji kesên pispor ra hat şandin. Ji bo kontrola farisî draft ji Muhamed Teqewî ra, ji bo erebî ji Hekar Findî ra û ji bo îngilîzî ji Patrick Lewisî ra hat şandin û serraştîkirinên hewce li gor têbînîyên wan pisporan hatin kirin.

Piştî ku kontrola edîtoryal ya giştî xelas bû ji bo cara dawî, draft ji çend kesên pispor yê wekî Reşo Zîlan û Zana Farqînîyî ra hat şandin. Piştî têbînîyên wan dîsa jî serraştîkirinên hewce hatin kirin. Di encama hemû kontrolkirinan da redaksîyona vê xebatê hat kirin û xebat bi dawî bû.

Herî dawî mirov dikare behsa hinek astengî û zehmetîyên vê xe-

batê jî bike. Lewra xebatên weha demdirêj ku sê-çar salan dewam di-kin, hem plansazîyeka baş hem jî ji alîyê madî ve îmkanan dixwazin. Birêxistina civînan, koordînasyona navbera sazgehan, peydakirina cihê guncaw, di civînan da moderatorîyeka cidî, hemû tesîrê li serkeftina xebatê dikin.

Astengîyeka din jî ji ber pergalên hiqûqî yên cuda derdiket. Di civînan da pirsên ku: “Gelo referansa sereke dê çi be?, Referans dê îngilîzî yan erebî yan tirkî be?” gelek caran serê merov diêşand.

Dîsa di van xebatan da dîsîplîna beşdaran û rewşa beşdarîya wan, gelekî giring e. Heta ku me ev xebat xelas kir, gelek kes hatin dawet-kin ku tenê çend caran beşdar bûn.

Encam

Kurdîkirina termên hiqûqê çawa ku ji qonaxên jorîn jî xuya dibe karekî gelekî zehmet, demdirêj e û berpirsyarîyeka cidî tê da heye. Lewra çêkirina terman bi giştî karekî pisporî ye û lazim e ji hêla pisporan ve pêk were. Hevkarîya pisporên ziman û pisporên hiqûqê di vê xebata me da jî gelekî giring bû. Em bawer dikin ku tenê ziman-nasan yan jî tenê pisporên ziman ev xebat bikira dê gelekî kêmasî tê da hebûna. Tesbîtkirina rê û rêbazên rast û plansazîyeka baş jî di serkeftina xebatên weha da gelekî tesîrdar in. Eger term baş nehên nîqaşkirin û nirxandin, mumkun e ku biryarên ne di cih da bihên wer-girtin. Loma rêbaza komxebatan û moderatorîya ku dihê kirin aşt xebatê jî dîyar dike. Herweha sûdwergirtina ji tecrubeya başûrê Kur-diştanê û bi taybetî jî tecrubeya kurdîya naveraşt pir alîkarîyeka baş kir di vê xebatê da.

Pêvek: Çend Rûpel ji Ferhengê

Berga Hundir

Ferhenga Têgihên Hiqûqê

Editor

Mikail Bilbil & Sabir Ebdulahizad

Komxebata Hiqûqê

Bahîz Omer Ehmed, Bexar Tahir Seîd, Bilal Zîlan, Cemîl Çeltîk, Ebdilâh Cîsîmî Receb,
Ebdilâh Çager, Ebdilwehab Xalid Mûsa, Fexrî Karakoyunlu, Gevriye Adî, Hekar Fîndî,
Mehdî Cefîzade, Mikail Bilbil, Nasîh Huseîn Sûlman, Rênas Xanekî,
Sabîr Ebdulahizad, Selahî Reşîd Qulî, Selhîrîlîn Elcî, Semîrî Nergîz,
Serdal Oğmen, Serpil Dîq, Veysel Kevêk



Baraya Diyarbekirê



WÊŞPA
MEZOPOTAMIYÊ

bîrewer *r.* (Ing. discerning/discerning minor, *t.* mûmeyyîz) *hiq. med.*: Kesê ku dikare feyde û zerara xwe ji hev veqetîne. Mînak: *Dadgehê, ji ber nerazîbûna serperîştê kesê bîrewer, li yara betalkirina girêbesta wî da.* Bîrewerî, ne girêdayî temen e lê belê piranî ji bo zarokan heriya temenê balixbûnê dihê bikaranîn. Kesê bîrewer bi destûra bav yan jî serperîştê xwe, dikare bibe aliyê girêbestê. Bin. *birbir, sinordar, gihîştî*

boçûna dadî (Ing. judicial opinion, *t.* îctibat) *hiq. med.*: Derbarê mijar yan jî dozeka hiqûqî ya taybet da, yekbiryariya dadgeha bilind. Mînak: *Boçûnên dadî, hingeha gelek şirweyên xurt yên hiqûqî ne.* Bin. *dadgeh, dadger*

bono *m.* (Ing. bond/promissory note, *t.* bono) *hiq. baz.*: Rûpeya bazirganî ku rêjeyeka diyar ya pereyî li xwe digire û di rewşên taybet da (deyndarî yan jî qeyrana abort), ji aliyê şirketên bazirganî yan jî dewletê ve dihên firotin. Mînak: *Bono ji bo cara yekem hertîm ji bihayê xwe erzanîtir dihên firotin.* Bin. *çek, polîçe*

budçe *m.* (Ing. budget, *t.* bûlçe) *hiq. baz.*: Plansazi û texmîna hatin û lêçûnên sala malî. Mînak: *Parlamentoyê budçeyê sala bihê erê kir.*

cenin/avlime *m.* (Ing. embryo, *t.* cenin) *hiq. med./hiq. stz.*: Zarokê di malzarokê da, ji hefteya heştemîn heta dema jidayikbûnê. Mînak: *Rewşa qanûnî ya ceninan, di hiqûqê Amerikayê da ewla ye.* Bin. *mirat, ducanî*

cihê avadan (Ing. residential area, *t.* meskun mahal) *hiq. med.*: Cihê ku bi piranî ji malan pêk dihê û rêjeyeka kêr ya avahiyên bazirganî û pişesazî tê da bi cih bûnê. Mînak: *Sênîyên wî cihê avadan bi piranî kurd in.* Bin. *rûniştgeh*

cihê darazê (Ing. place of jurisdiction, *t.* yargî yeri) *hiq. karg.*: Ew herêma ku dadgehê tê da xwedî rayeya xebatê ye. Mînak: *Qanûn sinorên cihê darazê diyar dika.* Bin. *dadgeh, daraz*

cihêz *n.* (Ing. trousseau/dowery, *t.* qeyiz) *hiq. med.*: Kuma mal û heyênên gubêzbar ku jin bi armanca sîdwergirtin, bikaranîn yan jî xemilandina

Fêrhenga Têgihên Hîqûqê

| | | | | |
|-----------------------------|---------------------------------|---------------------------------|-------------------------------------|-------------------------|
| aklatma | xapandin | infidelity | خداخ | خیانت/غریب |
| aleni | eşkere | public (open) | عَلَنِي | علني |
| alici | bikir | buyer | عَشَر | خريدار |
| alam satm | kirin û firotin | buying and selling/business | بيع و شراء | خريد و فروش / داد و ستد |
| alt işveren | jêrkarder | sub-employer | صاحب عمل فرعي | کارفرمای جزء |
| alt yüklenici | jêrgirêbestkar | subcontractor | مقاول ثانوي / مقاول فرعي | پیمانکار جزء |
| amme alîcakkari | wergirtinên giştî | public daims (ev | قبض عام | دریافتی عمومی |
| anayasa | Qanûna Bîngehîn/ Destûr | constitution | الدستور/قانون اساسي | قانون اساسی |
| anayasa hukuku | hiqûqa Qanûna Bîngehîn | constitutional law | القانون الدستوري | حقوق اساسی |
| Anayasa Mahkemesi | Dadgeha Qanûna Bîngehîn | constitutional court | المحكمة الدستورية | دادگاه قانون اساسی |
| angarya | suxre | angary | سخرة | غرضمالی |
| Anglo-Sakson Hukuk Sistemi | Perpala Hîqûqê ya Anglo-Saksonî | common law system (Anglo-Saxon) | نظام القانون العرقي (الأنكوساكسوني) | نظام حقوقی کامن لا |
| anlaşma | lihev/hatin | agreement | اتفاق/توافق | توافق |
| anlaşmalı boşanma protokolü | girebesta beyberdanê | negotiated divorce protocol | عقد الطلاق | عقد طلاق |
| anlaşmazlık | lihevnehatin/ lihevnekirin | disagreement | عدم الاتفاق | عدم توافق |

Çavkanî

Ebdulahîzad, Sabir. (2018). *Ferhenga Têgehên Hiqûqa Navnetewî (Îngilîzî-Kurdî-Tirkî-Farîsî)*. Wan: Sîtav.

Farqînî, Zana (2000). *Büyük Türkçe-Kürtçe Sözlük, Ferhenga Mezin a Tirki-Kurdî*. Stenbol: Weşanên Enstîtuya Kurdî a Stenbolê.

Farqînî, Zana. (2010). *Ferhenga Kurdî-Tirkî/Tirkî-Kurdî*. Çapa Çarem. Stenbol: Weşanên Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê.

Gümgüm, Bahattin. (2015). *Ferhenga Termên Fenî*, İsmail Beşikçi Vakfı Yayınları. İstanbul

Hassanpour, Amîr (2005). *Kürdişanda Milliyetçilik ve Dil 1918-1985*, Stenbol: Avesta Yayınları.

Îzolî, D. (2013) *Ferheng Kurdî-Turkî / Turkî-Kurdî*. (çap 7) Stenbol: Weşanên Deng.

Kıran, Abdullah (2014). *Ferhenga Zanîstên Cîvakî*. Stenbol: Nûbihar.

Özdemir, Hüseyin. (2014). *Hukuk Sözlüğü (Türkçe - Kürtçe)*. İstanbul: Belge Yayınları.

Talebanî, Nûrî. (2006). *Ferhengî Qanûnî, Erebî-Kurdî-Ferensî-Îngilîzî*. (çapî duem). Silêmanî: Mektebî Bîr û Hoşyarî.

Talebanî, Nûrî. (2006). *Ferhengî Qanûnî, Erebî-Kurdî-Ferensî-Îngilîzî*. (çapî duem). Silêmanî: Mektebî Bîr û Hoşyarî.

Yavuz, Suat (2014). *Ferhenga Teknîk. Tirkî-Kurdî, Tirkî-Tirkî*. Makine Mühendisleri Odası Diyarbakır Şubesi.

The Location of Applied Linguistic on the science map



By: Prof. Dr. Prof. Dr.
Abdullah Hussein Rasool

College of language, Kurdish department

University of Salaheddin - Erbil

Summary:

This research concerns about the location of linguistics in general, especially applied linguistics on the science map. To achieve this aim it devices in to two chapter:

At the first chapter, the researcher tries to answer these questions: What is science? What are the branches of science? What is the deference among pure science, humanities and applied sciences?

In chapter two, he talks about general linguistics, its branches, what is the deference between theoretical linguistics and applied linguistics? And what is the deference among their branches?

(Chapter one)

The definition of science

Introduction:

In ancient times, Philosophy was talking about all science, but nowadays every science talks about its materials or elements. According these elements, the science classified to all these sciences, for example: Chemistry deals with the internal elements of materiality, but Physics deals with the external elements of materiality, for example, for definition of water, Chemistry says: (Water is a material that made up from two molecules of Hydrogen and one molecule of Oxygen.), but for definition of water, Physics says: (Water is a material that hasn't any color, taste and smell. It freezes in 100 degrees centigrade, and boils at zero degree centigrade.).

Since ancient times, scientists have been trying to turn the humanities into natural sciences, by finding fixed or standard units for their component elements, by creating smart devices to measure these units, such as shown in this table¹:

١ پ.د. عەبدوللا حوسەین رەسول. ٢٠٠٤. ئایا زمانەوانی زانستیکى سروشتیه؟ یان ویژەییە. گوڤاری زانکۆی سه‌لاحەددین. ژماره (٢٢). ١٦١.

| | Elements | Old measurements | New measurement |
|----|----------|--------------------------------|-------------------------|
| 1- | Length | Any rope, steps, hand cuff... | Meter, mile, centimeter |
| 2- | Time | Days, months, seasons, ... | Hour, minutes, seconds |
| 3- | Weight | Arbitrary measurements, ... | Kilo, grams, pounds... |
| 4- | Strength | Strong, very strong, weak, ... | Dine, newton, |
| 5- | Speed | Speed, very speed, slow, ... | Kilometer on hour, ... |

As a result, (Every science is defined as the subject that investigates its components). According to these component elements, the sciences are device to three kinds, which are²:

1-1-Pure sciences:

Pure sciences, or (natural sciences) are sciences that their component elements have standard units of measurement. Such as: Physics, Chemistry, Mathematics, Geology,

1-2-Humanities:

Humanities, or (Humanity sciences) are sciences that their component elements haven't standard units of measurement. Such as: History, sociology, psychology, politics, law,

1-3-Applied sciences:

Applied sciences, are sciences that use natural sciences in the service of the humanities. Such as: Engineering, Medicine, Agriculture, Industry, ...etc. for clarification: When someone has a pain, goes to a doctor. (Pain is un element doesn't has measurement, it means that pain is humanity element). Doctor hangs on, or cling some things, which are elements of pure science, such as, X-ray, blood pressure, (from physics), drugs, (from organic chemistry), that's how the doctor can treat the patient.

٢ پ.د. عەبدوللا حوسێن رەسول. ٢٠١٥. چەند باسیکی وردی زمانەوانی - کوردی. بەرگی یەکمەم. چاپی یەکمەم. هەولێر. ٤٥٩.


(Chapter two)

The branches of general linguistics

There are two analyses or expressions about general linguistics, one says that, general linguistic is the science which studies all languages in general, the other says that, it is an independent science which studies everything about the component elements of human languages, their classification, how they work, what're their useful, and relationships....

(General linguistics thus includes the theoretical, descriptive and comparative biases of the subject. It is sometimes seen in contrast with those branches of linguistics where there is an interdisciplinary or applied orientation as in sociolinguistics, applied linguistics.)³

(Different branches may be distinguished according to the linguist's focus and range of interest.)⁴ Thus, it devises in to two brunches, like in this diagram⁵:



3 David Crystal. 2003. A Dictionary of Linguistics & Phonetics. 5th ed. Blackwell publishing. P197.


4 Ibid. p273.

5 سەروانەکانی خوێندنی بالا - (٢٠٢٠).

هەکتۆرا. بەشی کوردیی کۆلیژی زمان.


2-1-The deference between theoretical and applied linguistics:

Theoretical linguistics is a science that studies the appearance aspects of language component elements which are sounds and inner or interior aspects of language component elements which are meanings. Thus, the language consists of two elements: sounds and meaning, the sounds carry or tote the meaning and transfer from the speaker to listener, and these two elements (sounds and meanings) work by a system called rule or grammar. Accordingly, theoretical linguistics just deals with language component elements: sounds, meanings and their rules, based on that it studies the levels: Phonetics, Morphology, Syntax, which the main branches of theoretical linguistics, because sounds are the physical aspects, we can measure them (by Decibels and Hz), and it falls within pure science, but the meanings we can't measure them and it falls within humanities. Thus, the levels: Semantics, Pragmatics. Text linguistics, they're considered like a secondary branch, as shown in this chart:



Here an important and logical question appears, that is: When everyone knows their language fluently, what are the benefits of knowing all these things in theoretical linguistics? or what did we benefit from studying these things?

Applied linguistics appeared to answer this question. Applied linguistics as an applied science use theoretical linguistics in the service of the humanities. According to its service applied linguistics divided into two branches: if its service or studying doesn't exceed the limit of the language, that means using the information and results from theoretical linguistic researches in favors of language development, without mentioning any other sciences, it called main branch of applied linguistics, such as: lexicography, discourse analysis, stylistic, language history, dialectology, language conflict, language families, translation, course design, course evaluation, creative writing, bilingualism, multilingualism, as shown in this chart⁶:



The secondary branch of applied linguistics, if its service or studying exceeds or overruns the limit of the language to the other science, such as psychology, sociology.... etc. then make new branches of applied linguistics, such as: psycholinguistics, sociolinguistics... etc. It means; when applied linguistics join together with another science, it makes a new secondary branch of applied linguistics. Such as: language philosophy, language and culture, language and media, language and politics, language and nation, language and acquisition, machine translation, machine writing, corpus linguistics, linguistic atlas, biolinguistics...etc.

Sources

David Crystal. 2003. A Dictionary of Linguistics & Phonetics. 5th ed. Blackwell publishing.

پ.د. عەبدوللا حوسێن رەسول. ٢٠٠٤. ئایا زمانەوانی زانستییکی سروشتیه؟ یان وێژیهیه. گۆفاری زانکۆی سه‌لاحه‌ددین. ژماره (٢٢). ل ١٦١.

پ.د. عەبدوللا حوسێن رەسول. زمانەوانیی کاره‌کی. (٢٠٢٠). سه‌روانه‌کانی خویندنی بالا – دکتورا. به‌شی کوردیی کۆلیژی زمان.

پ.د. عەبدوللا حوسێن رەسول. ٢٠١٥. چهند باسیکی وردی زمانەوانی – کوردی. به‌رگی یه‌که‌م. چاپی یه‌که‌م. هه‌ولێر.

•